Gufûgoyên diyarkirinê an têgihandin ji bo destjêberdanê

MAMMOGRAPHIE SCREENING PROGRAMM

mammo-programm.de

Rêzdar ên beşdar yên- fîlmkişanê (Screening),

Mafê wê yê ji bo guftûgoyeke nojdarî beriya pişkinî-na-Mammografiyê.

Ev guftûgoya diyarkirinê dikare agahiyên baş- û nebaş li dor berwext nasîna penceşêra singê di rêka pişkinîna Mammographie-Screening re, di gel berhevoka-Mammographie-Screening ê bide. Ev ne ji bo wê hindê ye, ko şîretan li dor metirsiyana taqekesî li kesayetiya we bête kirin.

Eger hun nexwazin di vê guftûgoya diyarkirinê de beşdar bibin, hun dikarin dest jê berdin. Çi encamên nerênî bo we, ji hêla guhdanê û sîgortekirinê ve peyda nabin, eger hat û penceşêra singê rû da.

- **We pêdivî bi guftûgoya diyarkirinê nîne? Êdî ji kerema xwe li ser vê belgeyê imze bikin, ko hun wê guftûgoyê naxwazin û bidin nivîsgeha qeydkirinê.**

- **Agahiyên zêdetir li dor guftûgoya diyarkirinê dixwazî? Me bo we pirs û bersivên giring komkirin. Eger hîn pirs ên we hebin, hun dikarin seredana me bikin.**

Taximê we yê Mammographie-Screening

Çi di vê guftûgoya diyarkirinê li dor programa Mammographie-Screening tê axaftin?

Guftûgoya diyarkirinê rê dide, ko hun agahiyên zêdetir ji yên di berhevokê de, ya di gel vexwendinê têtе danê, bi dest bixînî. Di wê guftûgoyê de, wê bijîjkê/a-Screening li dor fehsa berwexetnaskirina-penceşêra singê di çarço-veya programa- Mammographie-Screening başî-û ne-başiyan diyar bike. Di wê guftûgoyê de, derfet bo we heye, ko hun pirsên xwe li dor Mammographie-Screening di gel bijîjkê-Screening biaxivin.

Ev dan û stendin, cihê şêwirwergirtina we ya kesayane, li nik bijîjkê/a jinan yê çavdêriya we, ji bo berwextnasîna penceşêra singê nagire, ko behsê faktorên metirsiyê û imkana pêketina nexweşiya penceşêrê têtе kirinê

Wê encameke nerênî bo min durust bibe, eger ez beşdarî guftûgoya pişkinîna-Mammographie nebim?

Na. Eger hun nexwazin di guftûgoya Mammographie-Screening beşdar bibin, çu encamên nebaş bo sîgorta an jî guhdana bo we encam nade.

Hun naxwazin di guftûgoya diyarkirinê de beşdar bibin, ji kerema xwe vê diyarkirina ji bo nebeşdariyê, dema pişkinînê di gel xwe bînin.

We ev di gel vexwendina bo Mammographie- Screening wergirtiye. Ji bo yekîniya-Screening jî we derfet heye, hun wê têgihandinê imze bikin.

Imza we giring e, ji ber bijîjk erkdar in, ko wê diyarkirinê bo we ravekin û bibelge bikin,hun bixwazin û di wê guftûgoya diyarkirinê de beşdar bibin an jî nexwazin.

© KoopG

Çima ez nikarim guftûgoya diyarkirinê yekser beriya pişkinînê pêk bînim?

Pêdiviye guftûgoya diyarkirinê di demek guncayî de pêk were, ko hun têramiyayî bûbin, ka hun di pişkinîna bo berwextnaskirina penceşêra singe beşdar bibin an na. Ji ber wê jî ew guftûgoya diyarkirinê yekser beriya pişkinînê pêk nayê. Ji ber ew wêneyên tîjkê ko têne kêşandin ji hêla karmendên wî beşî ve yên pispor in, lew ra jî nepêdivî ye bijîjk amade be.

Ma ez nikarim vê guftûgoya diyarkirinê bi bijîjkê malê / bijîjkê jinana / û radiolog re li dar bixim?

Ev diyarkirina ji bo pişkinînan, tenê ji hêla bijîjkan ve, yên xwedan serpêhatî di wî biwarî de bi rê ve diçe. Her wisa jî, bo nimûne hun diyarkirinekê bo benckirinê tenê ji destê bijîjkekî pispor û şareza di biwarê bencê de werdigirin.

Diyarkirina başî û nebaşiya programa-Mammographie-Screening dikare, tenê di rêka bijîjkên pispor re pêk were.

Ev guftûgoya diyarkirinê çendî dirêj dike?

Dirêjbûna vê guftûgoya diyarkirinê cuda cuda ye. Bi wê hindê ve girêdayî ye, ka çend pirsên we li ser programa- Mammographie-Screening û berwextnasîna-penceşêra singê hene. Lê wek diyar, nema demê weke pişkinînê bi xwe dibe.

Çima ev guftûgoya diyarkirinê dikare li cihekî din ji bilî cihê Mammographie li dar bikev?

Kêşana fîlmê- Mammographie di rêka pisporên Radiologiyê re û nasîna encamên wê di rêka bijîjkî re, dikarin li cihên cuda pêk bên. Ev wê guftûgoya diyarkirinê jî bi xwe ve digire, ya beriya pişkinînê û ji hêla bijîjkên-Screening bi rê ve diçe.

Ev ravekirina destjêberdanê bo guftûgoya diyarkirinê ji bo carekê ye an paşerojê bo pişkinînên din e jî yên ji bo Mammographie- Screening?

Ev ravekirina destjêberdanê tenê bo vê rewşa pişkinîna-Mammographie ye.

We beriya her pişkinîneke-Screening mafê kesayetî bo ravekirinê heye. Ji ber wê jî pêdiviye her du salan, ko civanên pişkinînên Mammographie-Screening bibin, ev ravekirin bête imzekirin, wê dema hun nexwazin di guftûgoya diyarkirinê de beşdar bibin.

Wê çi bibe, eger ez ravekirina destjêberdanê imze nekim?

Bijîjka/ê- Screening erkdar in, di gel yasayên nexweşan serederiyê bikin. Pê ve bend jî belgeya, ko ya beşdar, ya di guftûgoya diyarkirinê de cih negirt, teqez dest ji diyarkirina beriya pişkinînê berdaye, di gel hebe.

Eger hun guftûgoya diyarkirinê nexwazin, lê ravekirina destjêberdanê imze nekin, rê li ber pêkanîna pişkinînan tête girtin.

Çima divê ez ravekirina destjêberdanê imze bikim?

Mafê we heye beriya tevdîra her serederiyekê (dermankirin), ko bijîjkê we yê we derman dike guftûgoyeke bi we re pêk bîne.

Eger hun bixwazin, hun dikarin dest ji vê guftûgoya diyarkirinê ya beriya pişkinînê jî berdin.

Di vê rewşê de, bijîk mecbûr e, wê destjêberdana we bibelge bike. Ji ber wê jî, pêdiviye hun ravekirina li ser destjêberdana ji guftûgoya diyarkirinê imze bikin. Ji kerema xwe wê ravekirina di gel bi xwe re bo civana pişkinînê bînin.

Ez dixwazin di guftûgoya diyarkirinê de beşdar bim. Li kû dikarim civanekî çêbikim?

Civana guftûgoya diyarkirinê beriya Mammographie dikare li her navendekê bête danîn. Têkilî di rêya vexwendineke nivîskî de çêdibe an jî hun dikarin li cihê qeydkirinê pirsiyar bikin.

Hun dikarin di Internet ê de agahiyên têkiliyê ya nivîsgeha navendî di rêka hijmara nemra bajêr de, di vê malperê de bibînin **www.mammo-programm.de/termin**

Pirsên we li dor programa-Mammo-graphie-Screening hene?

Me bersiv hene.

Malpera nû ya Mammographie-Screening:



fragen.mammo-programm.de

Têkildariya pêk ve: Kooperationsgemeinschaft Mammographie GbR
Goethestr. 85, 10623 Berlin, **presse@koop-mammo.de**, **www.mammo-programm.de**

Wêneyê sernîşanê: Carola Lauble, Wenegr: Viviane Wild

KOOPERATIONS GEMEINSCHAFT MAMMOGRAPHIE

Durum: Temmuz 2016